
Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (519)05-06-2026



## Desthilata Melleyan di navbera sebra împaratoriyan û dema rakirina bingehîn de

N. Dr. Mehmûd

Desthilata melleyan li Îranê ber bi dawiyê ve diçe, lê dema wê dawiyê ne tenê bi daxwaza gelan tê pîvandin, ne bi hestên dijberan, ne jî bi dengê dirûşmeyan. Desthilatên tevgergir û tengavker her dem hingê na hilweşin ku tundiya wan digihêje asta herî bilind, ew hingê dişewitin û dişikên ku buhayê wan li hundir û derveyî welatê wan ji sûda mayîna wan girantir dibe. Împaratorî, û li serê wan Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, bi gelemperî bi hizra tola lezgîn na tevgerin . . .

Dom» R:5




## Dalaho, Dubarebûna dîrokê an qonaxeke nû di tevgera rizgarîxwaziya neteweyî de

N. Serbest Urmiyê

Bi salan e hewlên veqetandina Îlam û Kirmaşanê ji pêkhateya siyasî, nasnameya neteweyî û dîrokî ya Kurdistanê tên dayîn. Siyasetên navendparêz, di rêya dabeşkirinên îdarî, guhertinên çandî û propagendeyên îdeolojîk de, hewil dane ku ji bo dûrxistina van deveran ji hizir û ramana hevpar a tevgera seranserî ya azadîxwaz a Kurdistanê, cixizeke dabeşkirinê bi terzeke berfireh û tevalî bi dor van herêman de bikeşînin. Lê dîrok tu carî rastiyan venaşêre.

Dom» R:3



## Kurd di navbera bêdengiya civaka navnetewey û hirsa rejîma dagîrker

N. Nasike Nesîrî

Girtiyê siyasî kesek an kom kesên ku ji ber nelihevhatina bi sîstema hikûmetê re têne girtin û ragirtin. Her çend ev xwedî dîrokeke dirêj be û meriv dikare bêje ku li seranserê cîhanê jî heye, lê li welatên dîktatorî, otorîter û sitemkar de, ev diyardeyek pir belav û rojane ye.Ji ber ku Kurdistan di bin desthilatdariya 4 welatên din de ye . . .

Dom» R:6




# Stratejiya Dualî: Tund û Nerim li şer de

Şerê di navbera Amerîka û Îsraîl û rêjîma Îranê tenê taktîk yan berçav nine, belku xwedî stratêjiyekî kûr û demdirêje û hemî ev kiryar û gotin ku rojane guhertin bi ser de tên tenê taktîk û riwaletî ne û dikarin parek ji mekanîzma şer bin, îca şerê leşkerî û êrîş be, yan dîplomasî, yan gef, yan danûstandin be. Parek ji wan şerê nerim, şerê pirûpagende, şerê derûnî, û yên dine ne.

Hekîne ne Amerîka û ne Îsraîl herwisa bê stiratêjî û amancdar, herwisa bo xweşî şerê digel Îranê dest pê nekirine, şerê wan 2 welatan renge taze bi berçav bi bombebaranê xuya dike, ev şerê wan 47 sale bi awayên cuda berdewam bûye, bi hemî taybetmendiyan jî ev şer di demekê de dawî pê bêt ku aliyek, aliyê dine ji nav bibe.

Şerê wan bi destbiserdegirtina balyozxaneya Amerîka li Îranê de, bi barmite girtinê, bi biloke kirina serweta Îranê, bi nebûna balyozxaneya Amerîka û Îsraîl li Îranê û nebûna dîplomasiyê. Bi çêkirina dehan girûpên terorîstî li nawçê de bi dijî Amerîka û Îsraîl, ji aliyê rêjîma Îranê, bi êrîş û kuştara Cihûyan li her derê cîhanê ji aliyê Îranê ve û teqandina navenda Cihûyan li Arjantînê, teqandina payîgehên Amerîka li Erebistan û Libnanê de, û gelek curên dine ên şer berdewam bûne.



Herduk alî êdî rengê hindê dide ku ji wî cure şerî westiya bin, lewma ev şer radîkaltir kirin, ger bo 40 rojan hêza Îranê bi êrîşan hate lewazkirin, lê bê guman pêwajoya wî şerî dê berdewam be, çi agirbest bê kirin yan ne, heman qonaxên lewazkirin û li encamê de sernixûnkirina rêjîma Beisa Îraqê wê li ser rêjîma Îranê diceribînin.

Gotinên tund ê Tiramp li beramber Netenyahu, dibe ku sedema serekî ya guhertina ji nişka ve di helwestên rayedarên Komara Îslamî ya Îranê de guhertinê çê bike. Di van demên dawî de, berpirsên bilind ên wekî Qalîbaf û Iraqçî bi tundî giranî dane ser rawestandina şerê Libnanê û parastina Hizbullahê. Ev nêzîkatî nîşan dide ku mijara Hizbullah û rakirina qedexeyên deryayî êdî ne tenê şertek ji şertên danûstandinan in, belku ji bo Tehranê bûne pêşengiyên stratejîk.

Armanca min ev e ku nabe tenê em li rewaleta şer binêrin û bibînin, ev taktîk û bilind û nizmiya rojane jî em li gotin û kiryara aliyan de dibînin, nabe bandore li ser me û xebat û berxwedan û şerê me digel rêjîma Îranê bike.

Bi xatircemî vee v şer û alozî û dijminayetiya di navbera wan de jî tenê dê bi nemana aliyekê bi dawî bibe ku ev jî xuya ye kîjan alî ye.

# Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê li derheq pêla Nû ya bidarvekirinan li Kurdistan û Îranê de




Dezgeha tepeserkariya rêjîma Komara Îslamî, ji bo perdepoşiya şikestên xwe yên siyasî, leşkerî û ewlehiyê, pêlekî nû ya sêdaredana girtiyên siyasî li Îranê, bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê daye destpêkirin.

Tawan û cinayetên Komara Îslamî ku di van demên dawiyê de bi şêwazekî cihê ecêbgirtîmanê zêde bûne, û pêla nû ya tepeserî û zextan a li dijî xebatkarên azadîxwaz bi taybetî di girtîgehan de, mijarên asayî nîn in û nabe rê bê dan ku asayî bên nîşandan.

Ew sêdaredan û kuştinên siyasî, komkujî û qirkirinên birêxistinkirî ne, ji bo her kesî jî aşkera ye ku Komara Îslamî bidarvekirina girtiyan ji bo tirsandina zêdetir a civakê û xelkê û wekî mertalekê ji bo mayîna xwe ya zêdetir di desthilatê de bi kar tîne.

Tepeserî û sêdaredanên li hundur û berdewamiya mûşekbarankirina kamp û bargehên hizbên siyasî li Herêma Kurdistanê, di demekê de zêde dibin ku rejim di qada navdewletî de û di şer û pevçûnên xwe yên ligel Amerîka û Îsraîlê de tûşî şikesteke stratejîk û astengiyekî kûr a ewlehiyê bûye.

Ji ber vê yekê, mîna pîşeya xwe ya hertimî, berê xwe daye krîzafirandina li derveyî welat û kuştar û zextên pitir li hundurê welat.

Di heman demê de, berdewamiya tawan û cinayetên Komara Îslamî, ew jî di dema agirbesta demkî ya ligel Amerîka û Îsraîlê de, belgeyeke herî aşkera ye ku rejîm şerê xwe yê ligel azadîxwaz, mafxwaz û dijberên xwe yên navxweyî ranewestandiye, berevajiyê vê, her derfetekê, bi taybetî wê agirbestê, ji bo ji nav birina fîzîkî ya neyarên xwe bi kar tîne.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di wê baweriyê de ye ku daliqandina benkê sêdarê bo wan kesên ku bi tohmetên bêbingeh ên wekî "sîxurî" ji bo biyaniyan an "şerê çekdarî" yê dijî rejimê hatine girtin, di rastiyê de çeka tolhildanê ye ji xelkê xebatkar û mafxwaz.

Vê rêjîma mirovkuj di tevahiya temenê xwe de hewl daye ku bi sêdaredana têkoşerên siyasî, lêçûna xebat û xweragriyê li dijî desthilata xwe ya qirêj bilind bike û mafxwaziya neteweyên Îranê û tevgerên siyasî û medenî bixe qedeman.

Ji ber vê yekê, divê civaka cîhanî sêdaredana bi sedan girtiyan di salekê de li Îranê tenê wekî "binpêkariya mafên mirovan" nebîne, belku hewce ye ev kiryar wekî "tawanên şer" û "tawanên li dijî mirovahiyê" bên naskirin, û xwedî helwest û biryarên pratîkî bin li dijî van cinayetên rêjîmê.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di heman demê de radigihîne ku her dîplomasî, her danûstandin û her cûre agirbestek ligel Komara Îslamî ku rê li sekinandina tundûtûjiya navxweyî ya li Îranê û sêdaredan û binpêkirina sîstematîk a mafên mirovan ji aliyê vê rêjîmê ve negire, hem dibe handerê Komara Îslamî ji bo berdewamiya siyaseta kuştin û qirkirina xelkê azadîxwaz, û hem jî derfetê ji bo dirêjkirina temenê wê rêjîma mirovkuj û tepeserkar diafirîne.**

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê daxwazê ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, Parlamena Ewropayê û hikûmetên demokratîk jî dike ku ji bo sekinandina Komara Îslamî di berdewamiya tawan û cinayetên xwe de, zextên zêdetir bixin ser Komara Îslamî û peywendiyên xwe yên dîplomatîk ligel vê rêjîmê rawestînin.

Herwisa hewce ye pirsa tepeseriya navxweyî ya li Îranê û sêdaredanê bibin mijareke bingehîn di Encumena Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî de, û biryarên tund li dijî rejimê bên girtin.

Bêguman, heger lêçûna sêdaredanan û tundûtûjiya navxweyî li ser Komara Îslamî, îca çi siyasî û çi aborî be, neyê zêdekirin, reftar û siyaseta rêjîmê li hundurê welat de nayê guhertin.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê herwisa daxwazê ji neteweyên Îranê û hizb û aliyên siyasî yên opozîsyona Komara Îslamî dike ku bi yekrêzî û hevxebatiya xwe ya pratîkî, paşvekêşiyê bi siyasetên rêjîmê bidne kirin.

Em piştrast in ku xelkê Kurdistanê jî bi birêxistinkirina zêdetir a refên xwe û bi xebat û xweragriya xwe, wekî hergev dê bersiva siyasetên rêjîmê bide.

Serkeftî be xebata rewa ya neteweyên Îranê ya ji bo azadî û dadperweriyê.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**1ê Hezîrana 2026**



# Dalaho, Dubarebûna dîrokê an qonaxeke nû di tevgera rizgarîxwaziya neteweyî de



N. Serbest Urmiye



Bi salan e hewlên veqetandina Îlam û Kirmaşanê ji pêkhateya siyasî, nasnameya neteweyî û dîrokî ya Kurdistanê tên dayîn. Siyasetên navendparêz, di rêya dabeşkirinên îdarî, guhertinên çandî û propagendeyên îdeolojîk de, hewil dane ku ji bo dûrxistina van deveran ji hizir û ramana hevpar a tevgera seranserî ya azadîxwaz a Kurdistanê, cixizeke dabeşkirinê bi terzeke berfireh û tevalî bi dor van herêman de bikeşînin. Lê dîrok tu carî rastiyan venaşêre.

Îlam û Kirmaşan beşek in ji nasname û kevintirîn çeperên berxwedana tevgera neteweyî ya Kurd li Kurdistanê. Ji serhildanên herêmî yên li dijî zordariya Qacar û Pehlewiyan ve bigire heta beşdariya berçav a ciwan û xelkê van deveran di tevgerên siyasî yên hemdem de, belgeyên zindî ne ku pêywendiya vê cografyayê bi çarenivîsa giştî ya neteweya Kurd re diselimîmin.

Xwîna Mucteba û Meysem Weysî berdewamiya heman rêbaza dîrokî ye ku tê de bi salan e ku neteweya Kurd bi tepeserî, tinekirina fîzîkî û siyaseta bişavtinê a tevalî re ber bi rû ye, lê her tim bi hişyarî û rêxistinkirineke nûjentir ve li ser maf û daxwazên xwe yên rewa pêdagir bûye. Li gorî vê yekê, terorkirina van herdu birayan ji aliyê dezgehên tepeserkar ên rejîma îslamî ya Îranê ve, xwe di çarçoveya xebata neteweyî ya Kurdistanê ji bo azadî, nasname û rûmeta neteweyî de pênase dike û nabe ku tenê di çarçoveya nêrîneke ewlehî an karesateke mirovî de bê şîrovekirin.

Îro Dalaho sembolek e ji berdewamiya heman rêbaza ku bi dehan sal e têkoşerên Kurd li Mehabad, Urmiyê, Sine, Kirmaşan û deverên din ên Kurdistanê dest pê kirine.

**Dalaho, bingeheke din di tevgera azadîxwaziya netewey ya Kurd de**

Ji bo têgihiştina wateya siyasî ya wê berxwedana ku îro li Dalahoyê tê dîtin, divê em vegerin dîroka tevgera rizgarixwaziya Kurdistanê, Dîrokek tijî ji xwe gorkirina biçûk û mezinên gelekê ku bûne sembola hişyariya neteweyî.

Di nav kesayetiyên herî diyar ên dîroka hemdem a vê tevgerê de, mirov dikare navê Niho Bapîr Şikak, Îsmaîl Şerîfzade, Mela Aware, Silêman Muînî û hevrêyên wan bibîne; Ew têkoşerên ku nav û hizrên wan di berxwedana çekdarî û parastina rûmeta neteweyî ya Kurdan di tevgera şoreşgerî ya salên 1346 û 1347(1967-1968) 'an de dibrisqe.

Hemşêweyê vê tevgera niha ya Kirmaşan û Îlamê û bi dehan tevgerên din ên mafxwaziyê li Kurdistanê, sala 1346'an a Rojî û çend salan piştî hileweşandina Komara Kurdistanê, dema ku tevgera nû ya Rojhilatê Kurdistanê xwe ji bo bersivdana siyasetên nû yên çinekirina neteweyî, civakî û çandî yên rejîma dagirker nûjen dikir, hikûmeta Pehlewî bi hemû hêza xwe êrîşî şoreşgerên Kurd kir û xwe ji ti cinayetekê naparêze.

Di encamê de beşeke berçav ji rêber û têkoşerên vê tevgerê li herêmên bakur û naverasta Rojhilatê Kurdistanê Şehîd bûn. Her çend ev bûyer ji aliyê leşkerî ve derbeyeke bibandor bû li ser tevgerê, lê ji aliyê siyasî û derûnî ve bû sedema bihêzbûna ruhê berxwedana neteweyî di nava nifşa nû ya Kurdistanê de.

Îro Dalaho di heman rê û rêbaza dîrokî de dimeşe. Terorkirina Mucteba û Meysem Weysî di raya giştî ya Kurdistanê de wekî bûyereke navxweyî nahê mêzekirin, belkû dengvedana berdewamiya heman hizir û siyasetê ye ku bi dehan sal e bi zimanê guleyan bersiva daxwazên neteweyî û mirovî yên gelê Kurd dide.

Digel vê yekê jî, asta hişyarî û zanebûna neteweyî ya civaka Kurdistanê xala cudaker û berçaw a qonaxa niha ya xebat û berxwedanê ye. Ji dehsalên derbasbûyî ve bigire heta niha ku berevajîkirin û sansûra rastî û zanyariyan emrazê sereke yê rejîmên dagirker ji bo tepeserkirin û fetisandina dengê mafxwaziya gelan bûye, îro bi pêşketina cîhanê û geşekirina teknolojiya ragihandinê, xelkê Îlam û Kirmaşanê jî, hevdem bi xelkê seranserê Kurdistanê re, di asteke bilindtir de serpêhatiyên dîrokî û pêwendiyên wan bi çarenûsa giştî ya xwe re şîrove dikin.

Bi dengvehatina berfireh a xelkê li Îlam û Kirmaşanê, hevdem ligel bajarên din ên Kurdistanê, li hember terorkirina van herdu birayan (Mucteba û Meysem Weysî) ew rastî ji bo çendemîn car da selimandin ku civaka Kurdewarî li van deveran û li hember her cûre tevgerekê de ku gefê li bûn û nasnameya neteweyî bike, bêdeng nemaye û xwe wekî beşeke çalak di pêvajoya siyasî û dîrokî ya Kurdistanê de dibîne. Ev heman xala sereke ye ya ku dagirker jê tirsiyane: xala bihevgirêdana êşa takekesî bi civakê re ku dibe sedema bilindbûna asta hişyariya hevpar a giştî û neteweyî.

**Pêywendiya navbera tevgerên azadîxwaz li Kurdistanê**

Tevgera rizgarixwaziya Kurdistanê di çi qonaxekê de demkî an bi tenê çekdarî nebûye ku li gorî rewş û zirûfê wê qonaxa ku tê de serhildaye dest pê kiribe û bi dawî hatibe, belkî rêbazeke dîrokî û zindî ye ku nifş bi nifş hatiye veguhastin. Ji Simkoyê Şikak û Qazî Mihemed ve bigire heta pêşmergeyên salên şêstî(ên Rojî) û ciwanên îro yên Îlam û Kirmaşanê, rêbaz û xwestekeke hevpar her tim hebûye û heye: Jiyana azad tevî parastina nasnameya neteweyî û rûmeta mirovî.

Şehîdbûna têkoşerên tevgera azadîxwaziya Kurdistanê, tepeserkirina hêz û civaka Kurdî di salên borî de û niha jî terorkirina Mucteba û Meysem Weysî li Dalahoyê, ne xelekên zincîreke ji hev cuda ne, belkû beşek in ji zincîreyeke dîrokî ku nîşan dide pirsa Kurd hîn nehatiye çareserkirin.


Di vî warî de jî, girîngiya Îlam û Kirmaşanê zêdetir derdikeve. Ev herêm niha ne tenê xewle nemane, belkû beşeke bibandor in di tomarkirina deqa nasnameyê û bilindbûna asta hişyariya neteweyî ya Kurdistanê de. Geşbûna hişyariya neteweyî li vê beşa cografyaya Kurdistanê, nîşaneya têkçûna siyasetên dagirkeran e di asta çinekirina nasnameyê û bişavtina zordestî ya neteweyî û çandî de.

**Encam**

Dalaho îro tevî xwîna têkoşerên din ên rêya azadiya neteweyî û rûmeta mirovî bi xwîna Mucteba û Meysem Weysî re, bûye derwazeyeke din ji bo berdewambûna rêbaza azadîxwazî ya neteweyî li Kurdistanê. Rêbazek ku ji Mehabad û Urmiyê heta Kirmaşan û Îlamê nifşên cuda bi hev ve girê dide.

Îro zêdetir ji her carê Îlam û Kirmaşan di navenda cixiza tevgerên guhertinên nasnamexwazî û siyasî yên Kurdistanê de ne. Geşekirina asta hişyariya neteweyî li van herêman nîşan dide ku siyaseta înkar û serkutkirinê têk çûye. Nifşeke nû di vê qadê de serhildaye ku li hemberî her cure tevgereke berevajîkar radibe û hişyartir ji heyamên derbasbûyî, dîroka xwe û neteweya xwe dixwîne û bi nûjenkirina xwestek û mafên takekesî, giştî û neteweyî, xwe wekî beşeke girêdayî û bi bandor ji tevgera azadîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê pênase dike.

# Cîhan li pişt bûyeran



N. Şemal Terxîbî
W. Sîmîn Rûhanîzade



**Cîhana hêz û hevsengiyan**

Piraniya deman, mirov dîrokê bi bûyeran dixwînin. Şerek dest pê dike, hikûmetek tê hilweşandin, peymanek tê wajokirin an jî krîzeke aborî derdikeve holê. Lê ji dîtgeha stratejîk ve, bûyer dawiya çîrokê ye, ne destpêka wê.

Li pişt her bûyerekê hevsengiyeke hêzê heye. Li pişt her krîzekê berjewendiyek heye û li pişt her biryareke siyasî hewldanek ji bo guhertina balansa hêzê heye.

Cîhana îro ji her demekê zêdetir bi "hêzan" hereket dike. Lê hêz tenê çek û spah nîne. Di sedsala bîst û yekan de, têgihîştina ji hêzê berfirehtir bûye. Aborî hêz e, zanîn hêz e, teknolojî hêz e û heta şiyana afirandina raya giştî jî hêz e.

lewma, dewlet tenê li ser sînoran milmilanêyan nakin, belku di qada bazaran, çavkaniyên enerjiyê, rêyên bazirganî û cihê xwe di nav sîstema cîhanî de jî dikevin nav kêbirkê kirin û li dijî hev disekinin. Eva ye ku jêopolîtîkê ava dike.

**Jêopolîtîk tenê zanista xerîteyan nine**

Ew zanista têgihîştina wê ye ku cih çawa dibin çavkaniya hêzê. Çima hin derya girîng in? Çima hin sînor her dem aloz in? Çima hin derya girîngin çima hin sînor berdewam alozin, çima zilhêz ji hin deveran kom dibin û ji hin deverên din dûr dikevin?

Di cîhana îro de, piraniya şeran li ser berjewendiyên stratejîk in, her çend bi navê îdeolojî, ewlehî an mafên mirovan tên baskirin. Ji ber vê yekê ye, heke dixwazî bizanî çima tiştek qewimîye, hewceye li destpêkê de bipirsî: Kê sûdê jê werdigire? Hevsengiya hêzê çawa tê guhertin? Kê dixwaze balansa hêzê biguherîne?

Gelek caran ev pirs ji xwedî bûyerê girîngtir in.

**Cîhana rîwayet û zaniyariyan**

Heke sedsala 19 an sedsala pîşesaziyê bûye û sedsala 20 an sedsala spah û îdeolojiyane, wê demê sedsala 21 an bi awayekî balkêş sedsala zanyariyan e.

Îro gelek caran pirsgirêk ev nîne ku çi qewimîye; pirsgirêk ew e ku kê çîroka bûyerê vedibêje. û li vir de ye ku "şerê rîwayetan" dest pê dike.

Di cîhana berê de, dewletan hewl didan ku axa zêdetir kontrol bikin. Lê di cîhana îro de, gelek caran hewl tê dayîn ku hişê mirov zêdetir kontrol bibe.

Ji ber ku kesê ku dikare ramana gel bi rêve bibe, dikare kiryarên wan jî bi rêve bibe.

Di vê kantêkist û çarçoveya fikrî de mediyayan girîngiyeke taybet heye; ne tenê wek amûreke ragihandina nûçeyan, lê wek amûrek bo afirandina manayan.Bûyerek dikare di du kanalan de bi du awayên tewaw cuda bê pêşkêşkirin.

Wêneyek dikare du çîrokên cuda vebêje. zaniyariyek dikare du encamên cuda di mêşkê temaşevanan de biafirîne. Ji ber vê yekê, gelek caran milmilanêyên sereke ne li ser rastiyan e, belku li ser pênasekirina rastiyê ye.

Di vê çarçoveyê de, mediyayên civakî wek amûra herî nû ya cîhana ragihandinê, ew pêvajoye zêdetir aloz kiriye. Îro her kes dikare bibe berhemhênerê zaniyariyan, lê di heman demê de her kes dikare beşdarî belavkirina şaştiyan jî bibe.

Ya eşkere ev e ku di cîhana nû de zaniyarê bûye sermaye. Her kesek ku zaniyariyên zêdetir hebe, şiyana zêdetir ji bo çêkirina bandorê jî heye.

Ji ber vê yekê, îro şer tenê li meydana ceng de nayê kirin; wek ku em dibînin li ser şaşeyên mobîlan, li ser mediyayên civakî, di tîtirên nûçeyan de û di hişê mirovan de jî qewime.

Ji ber vê yekê em dikarin kurt û Kirmancî bêjin, tiştê ku cîhana îro diguherîne tenê tank û moşek nîne; zaniyarî ne.

**Îran, herêm û pêşeroj**

Di vê cîhana hêz û zaniyariyan de, Îran wek yekeyeke siyasî ne wek sîstimek siyasî yek ji girîngtirîn ekterên Rojhilata Navîn e.

Cihê wê yê cografyayî, dîroka siyasî, akinciyên wê, çavkaniyên xwezayî û bandora wê ya herêmî hemû bûne sedem ku Îran bibe beşeke girîng ji hevsengiyên herêmê.

Lê Îran tenê li derveyî sînorên xwe bi astengiyan re rû bi rû nabe; di hundirê welat de jî bi pirsiyarên mezin re rû bi rû ye.

Pirsiyara aboriyê, pirsiyara ciwanan, pirsiyara pêşerojê û pirsiyara têkiliya di navbera sîstema siyasî û civakî.

Gelek kes bawer dikin ku Îran li qonaxeke hestiyar de sekiniye; qonaxek ku tê de hêza man û hêza guherînê di yek demê de hene. Lê pêşeroja welatan tenê li paytextan nayê avakirin; di nav civakê de jî tê avakirin.

Ji aliyekî din ve, beşeke ne veqetandî ya çarenûsa xelkê cîhanê bi îrade û daxwazên xelkê ve girêdayî ye.

Eva jî pirsiyar li ser Kurdan jî dixe ser maseyan.

Di dîroka hevçerix a Îranê de, Kurd her tim yek ji ekterên girîng yên qada siyasî bûye. Lê îro, wek xwedî Îran, civaka Kurd jî hatiye guhartin.

Nifşeke nû derketiye meydanê; cîhan dîtiye, hizirkirin û zimanek cuda, û pirsên wê ji yên nifşên berê cuda ne.

Ji ber vê yekê, pêşeroja Kurdan tenê bi bûyerên siyasî nayê diyarkirin; lê bi şiyana xwe rêkxistin digel guhartinkariyan û, bi afirandina hizira stratejîk û bi nasîna cîhana nû jî tê diyarkirin.

Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku cîhana îro tenê bi bûyeran nayê xwendin. Ya ku em dibînin, gelek caran tenê rûyê rastiyan e.

Li bin vê rûyê de hevsengiya hêzê, şerê rîwayetan, têkoşîna berjewendiyan û komek hêzên veşartî hene ku arasteya îro û pêşeroja me diyarî dikin.

Li gorî vê yekê û di dawiyê de, ew tiştê ku çarenûsa neteweyan diyari dike tenê ew nîne ku çi qewimîye.

Belkî ew e ku kê têgehiştiye li pişt bûyeran çi derbas dibe, û bi şirovekirina rast a wan faktoran ku hatin behskirin, nexşerêya rast ji bo pêşerojê amade bike.

# Desthilata Melleyan di navbera sebra împaratoriyan û dema rakirina bingehîn de



N. Dr. Mehmûd Ebas

Desthilata melleyan li Îranê ber bi dawiyê ve diçe, lê dema wê dawiyê ne tenê bi daxwaza gelan tê pîvandin, ne bi hestên dijberan, ne jî bi dengê dirûşmeyan. Desthilatên tevgergir û tengavker her dem hingê na hilweşin ku tundiya wan digihêje asta herî bilind, ew hingê dişewitin û dişikên ku buhayê wan li hundir û derveyî welatê wan ji sûda mayîna wan girantir dibe. Împaratorî, û li serê wan Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, bi gelemperî bi hizra tola lezgîn na tevgerin, lê bi sebra dirêj, westandin, û amadekirina kêliya guncan dimeşin.

Desthilata Îranê, her çiqas bi hêza Pasdaran, milîsên girêdayî xwe, û amûrên bawerîparêz xuya bike ku xurt e, ne hêzeke serbixwe ye ku li derveyî nexşeyên cîhanê be. Ew parçeyek ji hevgirtineke cîhanî ya firehtir e.

Me di salên dawî de nîşanên vê rêbazê dîtin. Piştî ku Waşîngtonê di sala 2018an de ji peymana etomî derket, aboriya Îranê ket nav westandineke dijwar. Rîyal ji sala 2018an ve, piştî vegerandina cezayên aborî, zêdetir ji nod ji sedî nirxê xwe li hember dolarê winda kir. Beşên enerjî û avê jî ji kêmbûna veberhênanê û lawazbûna avahiyên bingehîn êş kişandin, wekî ku raporên Reutersê diyar kirin. Paşê serhildana Jîna Amînî, hat û eşkere kir ku qeyrana vê desthilatê ne tenê derveyî ye, lê di hundirê welat de jî kûr e. Li gor rêxistinên mafparêz, zêdetir ji pêncsed kes hatin kuştin, di nav wan de heftê û yek zarokên temenbiçûk hebûn, û hezaran kes hatin girtin.

Di Îlona 2025an de cezayên Neteweyên Yekbûyî li ser Îranê bi rêya makîneya "snapback" a girêdayî peymana atomî hatin vegerandin. Vê yekê Rojavayî careke din vegerand ser lêgerîna amûrên nû ji bo dorpêçkirin û çavdêriya bernameya etomî ya Îranê.

Paşê lêdanên Amerîkayê li ser cihên etomî yên Îranê di Hezîrana 2025an de hatin, û diyar kirin ku sebra împaratorî ne tê wateya lihevhatina bêdawî. Tiramp Tehran hişyar kir ku heger li ser rêkeftinekê razî nebe, êrîşên girantir dikarin bên. Her çiqas nirxandin li ser asta zirarê ji hev cuda bûn, peyama hêzê eşkere bû: desthilata Îranê êdî ne tenê bi cezayên aborî û danûstandinan tê rêvebirin, lê dema ku hesabên hêzê bixwazin, di bin sîwana hêza rasterast de ye.

Ji vir ve, dibe ku rakirina vê desthilatê encama lêdana yekem an duyem nebe, lê ji bo qonaxa sêyem a şerê were hiştin. Wê demê şer ne tenê avahiyên leşkerî wêran kiriye, lê rê ji bo dema rakirina bingehîn a rêveberiyê vekiriye, dema ku mayîna desthilatê di heman demê de bibe barek li ser hundir û derve.

Lê pirsgirêka herî mezin ne tenê di çûna desthilatê de ye, belku di pirsa cihgirtinê de ye. Împaratorî desthilatan na hilweşînin ji ber ku ji gelan hez dikin, û nexşeyan naguherînin ji ber hezkirina dadê. Ew wisa dikin dema ku berjewendiyên wan digihêjin asteke amadeyî, û buhayê desthilatê ji sûda wê mezintir dibe. Ji ber vê yekê, hilweşandina desthilata melleyan ne hewce ye ku bi xwezayî bibe destpêka Îraneke azad û gelparêz. Dibe ku Waşîngton, wekî ku piştî Seddam Husên li Iraqê kir, alternatîvekê bîne; an wekî ku li Sûriyê qewimî, cihgireke tundrêw bîne ku yên mayî ji civak, çand û şaristaniyê bixwe, piştî ku desthilata berê piraniya wan wêran kiribe. Metirsî ne tenê di desthilata ku diçe de ye, lê di valaahiya ku piştî wê tê de ye; di hêzên ku ji bo mîratgirtina wê tên amadekirin de ye; û di rengê wê welatê nû de ye ku li ser xakên welatê kevn wê were çêkirin.

Ji ber vê yekê, qonaxa pêşiya Îranê dikare ji qonaxa pevçûna niha jî metirsîdarter be. Heger desthilata Îranê bikeve qonaxa dawîn a hilweşînê, ew wek dîwarek tenê na rûxe; dibe ku saziyên welatê, torên aborî, navendên bajaran, û rehên civakê bi xwe re bikişîne, tam wekî desthilatên din ên serxwebir ku dema xwestin biçin, hilbijartin ku wêranî li pey xwe bihêlin, ne welatek ku dikare bijî. Ji ber vê yekê, çûna desthilata melleyan, ji aliyê bingehîn ve, wê dawî bîne ji bo yek ji herî tarî û sûcdar desthilatên herêmê; lê ew ne hewce ye ku bibe destpêka rizgariyê, heger nehêle Îran bibe Iraqeke din an Sûriyeke din, ango qadeke vekirî ji bo şerên cihgirên gemar, tundrêw û anînî ji odeyên biryara împaratorî.

Bi vê wateyê, şerê li ser Îranê divê ne tenê wek rûbirûbûneke leşkerî bê xwendin, lê wek kareke dirêj ji bo ji nû ve çêkirina welat, civak û desthilatê. Qonaxa yekem westandin bû bi cezayên aborî û tengavkirina jiyanê. Qonaxa duyem şikandina heybet û tirsanê bû bi lêdanên leşkerî yên rasterast. Qonaxa sêyem, heger were, dikare bibe qonaxa perçiqandina hêza hundirîn a desthilatê, û veguherandina wê ji desthilateke tepisîner û yekgirtî bo bedeneke rêveberî ya qels ku li bendê dimîne ji bo kêliya guhertinê. Wê demê, plana rakirina desthilatê gihiştiye amadeyî, ne ji ber ku xelkê Îranê tenê wisa xwestiye, lê ji ber ku hêzên mezin biryar dane ku dema bikaranîna vê desthilatê qediya ye, û cihgir, her çiqas kêm, gemar an tirsnak be, ji desthilata heyî bêtir dikare were bikaranîn.




Ji ber vê yekê, tiştên ku desthilata Îranê îro dike, divê ne wek nîşana hêzê bê xwendin, lê wek tevgerên desthilateke ku dizane qefes li dora wê teng dibe. Roket, milîs, dirûşme, gef, û lîstikên atomî, hemû amûrên dirêjkirina temenê wê ne, ne amûrên afirandina paşerojê. Desthilatên ku dikevin qonaxa westandina dîrokî, bi gelemperî hêza xwe ya acizkirinê bi hêza manê şaş dibînin. Ew dibêjin ger buhayê li ser yên din zêde bikin, wê yên din wan heta hetayê qebûl bikin; lê dibe ku ev yek bi xwe ew tişt be ku hêzên mezin ber bi biryara paqijkirina wan ve dibe.

Azmûnên Rojhilata Navîn eşkere ne. Saddam Husên bawer dikir ku destê ewlehiyê, şer, dirûşmeyên netewperestî, û lîstina li ser nakokiyên hêzên mezin ji bo manê desthilata wî bes in. Lê kêliya hesaban hat dema ku buhayê manê wî ji karê ku ji bo wî dihat kirin girantir bû. Beşar Esed jî bawer dikir ku xwîn, Rûsya, Îran, milîs, û veguherandina Sûriyê bo bazara şer, wê jê re bêdawîtiya rêveberî bide.

Desthilata melleyan di naveroka xwe de dişibe van desthilatan: desthilateke bawerîparêz û ewlehîgir e, ol û welat, şoreş û berjewendî, berxwedan û serdestî tev li hev dike, û bawer dike ku xwedîbûna milan li Iraqê, Sûriyê, Lubnanê û Yemenê jê re parastineke dîrokî dide. Lê ew tê nagihîje ku ew mil bi xwe dest pê kirine ku bibin bar; û împaratorî ji amûran ne nefret dikin heta ku ew bikêr bin, lê dema ku ew dibin tirs li ser avakirina hêza wan, wan ji holê radikin.

Amerîka wek împaratoriyekê sebr dike, lê heta dawiyê li hev na tê. Dibe ku danûstandin bike, paşde bixe, cezayên aborî bikar bîne, deriyan veke û deriyên din bigire, bihêle desthilat ji hundir ve lawaz bibe, û qasê wê ya paşvekişandinê biceribîne. Lê dema ku dibîne buhayê manê desthilatê ji buhayê guhertina wê mezintir bûye, qonaxeke din dest pê dike. Ji ber vê yekê, encama desthilata Îranê ne bi qîrînên wê tê diyarkirin, ne bi dirûşmeyên wê, ne jî bi xeyala wê ya bawerîparêz; lê bi wê kêliyê tê diyarkirin ku sê hêman li hev dicivin: hilweşîneke hundirîn ku fireh dibe, tengasiyeke aborî ya xeniqîner, û biryareke cîhanî ku dibîne dema bikaranîna wê qediya ye.


Desthilata Îranê hêj nerûxiyaye, ji ber ku kêliya dawîn hêj bi tevahî ne amadeye. Lê ew ketiye dema berî rûxînê:

Ji ber vê yekê, çûna desthilata melleyan ne pêxembertiyeke hestyarî ye, lê xwendineke li gor rêça dîroka nû ya rêveberiyê ye. Her desthilatek ku welat dike bawerî, civakê dike dîl, aboriyê dike amûra şer, û derve dike qada hêza xwe, di dawiyê de digihêje kêliyeke ku êdî ne dikare were çaksazkirin û ne jî dorpêçkirin. Wê demê desthilat na rûxin ji ber ku tenê lawaz bûne, lê ji ber ku di çavên wan hêzên ku demeke dirêj li ser wan sebr kirine de, karê xwe winda kirine.

# Kurd di navbera bêdengiya civaka navnetewey û hirsa rejîma dagîrker



N. Nasike Nesîrî
W. Hesen Mukerem



Girtiyê siyasî kesek an kom kesên ku ji ber nelihevhatina bi sîstema hikûmetê re têne girtin û ragirtin. Her çend ev xwedî dîrokeke dirêj be û meriv dikare bêje ku li seranserê cîhanê jî heye, lê li welatên dîktatorî, otorîter û sitemkar de, ev diyardeyek pir belav û rojane ye.

Ji ber ku Kurdistan di bin desthilatdariya 4 welatên din de ye, ku her yek ji wan beşek ji Kurdistanê dagir girine, Kurdên ku li dijî hikûmetên berê û yên niha yên van welatên dagirker bi cudakariya sîstematîk a siyasî, aborî û çandî re rû bi rû mane, ew rewşa han qebûl nekirine.

Desthilatdar, rejîm û avakirina hikûmeta Kurdistanê ne tenê ji hêla van dagirkeran ve nehatiye qebûlkirin, belku di heman demê de bi awayên herî dijwar jî cehda jinavbirina wan hatiye dan, yek ji wan jî girtina siyasî ye.

Carna, kesên Kurd ji ber sedemên siyasî tenê girtin û di rastiyê de kiryarên wî kesî qet siyasî nebûne, lê belê ew tiştê ku ji aliyê rejîma dagirker ve weke hêceta siyasî tê binavkirin, rêyek bûye ji bo tunekirin û betalkirina her daxwazek mafên Kurdan.

Ev diyarde li Bakur, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê xwedî dîrokek dirêj e û bi sedan û heta bi hezaran mînak hene.

Bo mînak, mirov ji ber hebûna çekan di malên xwe de hatine girtin û hepskirin, lê sedema sereke tenê ew bûye ku ew ji çanda Kurdî re eleqedar bûne û xwastine nasnameya xwe ya neteweyî di nav malbatên xwe de biparêzin.

Ev yek ji me re dibêje ku li welatên dagirker ên Kurdistanê û di rûbirûbûna wan a bi Kurdbûnê re, heta dabeşkirin û pênaseyeke zelal a siyasetê jî tune ye û kesên Kurd dikarin bêyî sûc û tenê bi tohmeta siyasîbûnê werin girtin û heta werin bidarvekirin.

mînakek ji vê yekê 49 ciwanên xelkê bajarê Mehabadê ne, ku parek ji wan zarok bûn û ti çalakiyên siyasî encam nedabûn.
Xalek din a derbarê girtiyên siyasî de, hejmara zêde ya girtiyên siyasî di nav Kurdan de ye li gorî neteweyên din, nemaze neteweya serdest.

## Rapora Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ya 2025an bi zelalî îşarê bi vê yêkê dike ku ji sedî pêncî zêdetir ji girtiyên wê yên bi sûçê siyasî û ewlehî li Îranê Kurd in.

Li Îranê, tenê piştî serhildana Jînayê û şerê di navbera Îranê û Amerîka û Îsraîlê de, hejmara girtiyên siyasî yên Faris û Tirk bi taybetî zêde bûye, lê berê ew pir kêm bûn.

Lêbelê, muameleya bi wan re ji ya girtiyên siyasî yên Kurd cuda ye.

Bo mînak, gelek girtiyên siyasî yên Faris hene ku mîna Nergês Mihemedî nivîsandine û xelatên navneteweyî wergirtine.

Lêbelê, girtiya siyasî ya Kurd Zeyneb Celaliyan ev nêzîkî 20 salan e ku di girtîgehê de ye û asta ronahiya çavên wê pir kêm bûye.

Mixabin, nebûna medyaya Kurdî, tevliheviya pirsgirêkên mafên mirovan ên Kurd û Îranî, û kontrola Îraniyan li ser rêxistinên navneteweyî yên mafên mirovan li derveyî welat jî sedem in ku çima li wir kêmtir behsa girtiyên siyasî yên Kurd tê kirin û ew rastî cudakariya sîstematîk tên.
Piştî Serhildana Jînayê û êrîşên Îsraîl û Amerîkayê yên li ser Îranê, rejîmê dîsa bi dehan ciwanên Kurd li bajarên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê bi tohmetên çewt yên wek hevkariya bi Îsraîlê re û sîxuriyê girtine û darve kirin e. Gelek sebeb hene ku bêgunehiya wan û sextebûna sûcê wan îspat dikin.

Di dawiyê de, sûcê siyasî û girtina ji ber sedemên siyasî rêbazek siyasî û naskirî ye ku dewletên dagirker dixwazin Kurdistanê her û her li tevger û coşê bixin û lêçûna têkoşîn û mafên xwe zêde bikin, ew wan pêk tînin.

Wan sûcên xwe bi terazûya xwe pîvandine û dadgehên xwe li gorî daxwazên xwe birêve dibin û her cezayê ku dixwazin disepînin.

Ji aliyeke din ve,rêkxistin û saziyên çalak ên Kurdî jî gelek xema vê pirsê naxon û mixabin heya niha nekarîne dengê rastîn ê girtiyên siyasiye Kurd bigehînin nava qada rêkxistinên navnetewî û piştgîriyekê çêkin ku ev piştgîrî û lobî bikare givaşê bixe ser rêjîma dagîrker û cane girtiyan ji egera bidarvekirinê biparêze.

Ev yek bûye sedem ku destên dagirkeran bêtir û bêtir vekirî bin û bêyî tirsa bedelê, bi berdewamî û bi awayeke sîstematîk, ciwanên Kurdistanê tune bikin.

Heta ku ev pêvajo neguhere, Kurdistan û dayîk û bavên wê dê dilşikestî bimînin.

Civaka navneteweyî vê yekê weke pirsgirêkek navxweyî dibîne û me nekariye wê weke cudakariya sîstematîk an jî jenosayîda sîstematîk pênase bikin û ji cîhanê re bidin nasîn.

Ev pêvajo dikare were guhertin.



## Nerîna Lîderan



**"Ebdullah Hesenzade":**

**"Armancên siyasî yên Kurdan bi bingehîn ji yên hêzên biyanî cuda ne."**



**"Mesûd Barzanî":**

**"Çeka Pêşmerge ne tenê parçe hesin, cebexane yan amûreke şer e, çeka Pêşmerge nîşana dîrok, fîdakarî, rûmet û baweriyê ye. Ev çek wefadarî û peymana Pêşmerge ye li hember gel, ax û nîştimanê xwe"**



**"Donald Trump":**

**"Îran hûn 47 sal in vê yekê dikin û êdî rê nayê dayîn ku ev yek wihabidome."**



**"Benjamin Netanyahu":**

**" Bingehên Komara Îslamî hilweşiyane."**

# Teror, tepeserî û Tirs ji Hişyariyê, Dênek li Şehadeta Birayên Weysî li Kirmaşanê



N. Eskender Ceiferî



Makîneya têror û tepeserkariya rêjîma Îranê, ev salên dûr û dirêj e ku bê rawestan, jiyana xortên herî dildar û fîdakar ên neteweyên di bin zordariyê de dike armanc. Ev rêjîma sitemkar ku mayîna xwe di ji nav birina fîzîkî ya dijberan, afirandina tirs û xofê û tunekirina her cure çavkaniya hişyariyê de dibîne, vê carê jî li devera Dalaho ya Kirmaşanê dest avêt tawaneke hov û bêrehmane.

Terora hovane ya du birayên çalakvan ên Kurdên Yarsan, Meysem û Mucteba Weysî, rûyê din ê faşîst û dagirker ê rêjîma Îranê li hember neteweya Kurd û mafên wan ên binpêkirî nîşan da. Van du birayan ne bi çekê, belkî bi çeka pirtûk û ramanê û di riya parastina nasnameya xwe ya netewî û çandî de gav diavêtin, lê hişyarkirin tam ew tişt e ku bingehên rizîbûyî yên dagirkar dihejîne.
Meysem û Mucteba Weysî ku ji damezrînerên pirtûkxaneya "Dere-Dirêj" li Kirmaşanê bûn, sîmbola nifşek ji ciwanên xebatkarên Kurd bûn ku li dijî dagirkeriya çandî û siyasî rabûn û bi dilxwaza xwe, jiyana xwe diyarî xizmeta niştiman û zindîkirina nasnameya xwe kirin. Çalakiyên çandî yên van her du birayan di çarçoveya parastina dîrok, ziman û resenetiya Kurd de hatibûn avakirin, nasnameyek ku her dem bûye çiqlên çavê desthilatdariya tepeserkar a navendî.

Qirêjxwe û hêzên ewlehiyê yên rêjîma Îranê ku şiyana dîtina navendên wiha yên hişyarî û nasnameyê nîn e, beriya niha jî gelek caran ev du çalakvanên Kurd girtibûn, îşkence kiribûn û gef lê xwaribûn. Mucteba herî dawî Newroza du salan berî niha, piştî demeke dirêj lêpirsîn û îşkenceyên hovane, bi barimteya giran a bi bihayê 700 milyon tûmenî bi awayekî demkî hatibû berdan, barimteya ku piştre ji aliyê saziya dadwerî ya rêjîmê ve hat zewtkirin.

Zext û gefên berdewam ên dezgehên ewlehiyê yên rêjîma Îranê piştî xwepêşandanên zivistana sala borî gihîştin asta herî bilind û ev du bira neçar kirin ku ji bo parastina jiyana xwe, bi dizî li gundê "Qela Kûş" ê li devera Dalahoyê bicî bibin. Tevî vê yekê jî, kîna hovaniya rêjîmê ji çalakvanên ku mîna çiyayan li hember siyasetên helandina çandî li ber xwe didan, bêdawî bû. Li gora raporên rêxistinên mafên mirovan, terorîstên rêjîma Îranê, mala ku her du bira tê de bûn dorpêç kirin û di tevgereke hovane, tirsonek û organîzekirî de, ew şehîd kirin. Ev têrora hov, sîmbola berçav a siyaseta faşîst û dagirkarî ye ku rêjîma Îranê li Kurdistanê dimeşîne, siyaseta ku bersiva her cure mafxwazî û parastina nasnameya netewî bi fîşeka rasterast dide.

Bersiva civaka Kirmaşan û Yarsanê bo vê tawanê, nîşaneya şikestina tirsê û rûreşî ji bo rêjîma Îranê di vemirandina agirê xebatê de bû. Xelkê herêmê bi berovajîkirina atmosfêra ewlehiyê, rêwresmeke mezin, bêhempa û berfireh ji bo sersaxiya Meysem û Mucteba Weysî li dar xist, hewldanek ku nîşan da xelk ne tenê ji têrorîzma dewletî ya rêjîmê natirse, belkî xwîna van şehîdan, kîna pîroz a bindestan di riya rûxandina vê dagirkariyê de bihêztir dike.

**Dengê Mucteba Weysî ku basa hezkirina ji xakê û hewla parastina nasnameya Kurdî dikir, îro bûye sirûdeke şoreşê ji bo hemû ciwanên ku li hember dagirkeriyê serî hildane. Tirs û xofa rêjîma Îranê ji van dengan, nîşaneya vê rastiyê ye ku ti rewatiya vê pêkhateya gendel nîn e û tenê bi piştqahîmiya bi çek, sêdare û têrorîzma eşkere li ser kursiya desthilatê rûniştiye.**

Naveroka rêjîmên tepeserkar di dirêjahiya dîrokê de hertim wek hev bûye. Wekî ku Frantz Fanon, bîrmendê navdar, tîne ziman, dagirkar, tenê bi bendkirina fîzîkî ya mirovên neteweya bindest nasekine, belkî bi awayekî micid ji bo şewitandin, tunekirin û bêrûmetkirina dîrok û çanda wan tevdigere. Rêjîma dagîrkar a Îranê jî li Kurdistanê tam heman stratêjiya dijî-mirovî dişopîne, hewla ji navbirina zimanê Kurdî, ola Yarsan û nasnameya Kurdî bi rêya têrora fîzîkî ya çalakvanên sivîl û çandî dide. Lê vê desthilatdariya dagirkar ji bîr kiriye ku hişyarî, girêdaneke neveqetiyayî bi xakê re heye û bi têrorkirina çend pêşengan, tevgera azadîxwaziya Kurdistanê tu carî nayê vemirandin.

Gotinên Apê Mûsa Enter, xebatkarê navdar ê Kurd, bi awayê herî rast rewşa îro ya Kurdistanê li hember desthilatdariya dagirkar a Îranê tîne ziman: «Heke zimanê min bingehên dewleta te dihejîne, ev nîşan dide ku te dewleta xwe li ser xaka min ava kiriye».

Tirsa rêjîma Îranê ji pirtûkxaneya Dere-Dirêj, ji cil û bergên Kurdî, ji Newroza Kirmaşanê û ji navê Meysem û Mucteba, şahidiya pûçbûna wê hêzê li hemberî şiyarbûna neteweyên mafxwarî ye. Xwîna paqij a birayên Weysî, tovekî nû ji xezeb û berxwedanê di dilê çiyayên serbilind ên Kurdistanê de çand.

Xebata wan a dilxwazî û dilsozî di riya azadî û parastina rûmeta mirovî de, meşxelek e ku riya ketina vê rêjîmê hêsantir dike û nifşên bê ji bo mafxwaziyê bi çek dike. Rêjîma tawanbar a Îranê bi van têrorên tirsonek tenê hilweşîn û tunebûna xwe lezgîntir dike, ji ber ku nasnameya neteweyeke zindî û xebatkar bi fîşekan nayê binaxkirin.

**Di hejmara vê carê ya Rojnameya Agirî de me digel Hemîd Çepatî Çalakvan û Girtiyê Siyasî li derheq rewşa girtî û siyasetên rejîma Îranê li hember girtiyan hevpeyvîn encam daye.**



Çalakvan û Girtiyê Siyasî
Hemîd Çepatî

**Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade**

**1.Girtin, lêpirsîn û dadgehîkirin di Îranê de li gorî yasayan tên kirin, yan her ji destpêkê ve bi sênaryoyek ewlehî û siyasî re rûbirû ye?**

Hikûmetek ku di nav civakê de, bi taybetî di nav gelê Kurdistanê de, meşrûiyetek nîne, neçar e ku ji bo domandina desthilatdariya xwe dest bi kuştin, komkujî, girtin, zindan û îdaman bike.

Ji bo vê armancê jî gelek dezgehên Îtilaatiyên miwazî ava kiriye da ku keşa civakî herî zêdetir ewlehî bike û bi tirs xelkê bitirsîne.

Li Îranê girtina kesan bi destê dezgehên ewlehiyê, bi taybetî Îtilaata Spahê û Wezareta Îtilaatê têne kirin. Carinan ev dezgeh bi hev re dixebitin û carinan jî ji bo amarên zêdetir riqabetê dikin.

Piştî girtinên dem dirêj û li cihên nediyar tên ragirtina hin kesan di odeyên takesekî de yên teng û sar de tên ragirtin û rastî standina îtirafên bi zorê tên,û rapora dawî ya pêvajoya îtirafkirinê ji aliyê lêpirsînerê ku bi navê “zabit” an “pispor” tê nasîn, ji dadgehê re tê şandin.

Piraniya caran, bêyî ku daxwazên berevaniyê an gotinên tawanbar bên berçavgirtin, bingeh û esasa biryara dadgehê tenê ew rapor e ku ji binzemînên dezgehên îtilaataî û odeyên take kesî tenê wergirtin.

Di salên dawî de, bi îfadeyên zindaniyan, gelek raporan û herwisa bi tecrubeya min bo min îsbat bûye ku biriyarên nedadperwerane ku tên sepandin û cane gelek ciwanan dixin metirsiyê de û wan ber bi dare darvekirinê dibin, tenê li ser esala ev rastiyên ku min bas kirine tên cîbicîkirin.

**2. Li gorî tecrûbeya we, dezgehên ewlehiyê heta çi radeyê li ser pêvajoya dadgehê û dana biryaran bi ser girtiyên siyasî bandor û kontrol hene?**

Li navendên girtinê yên Îtilaata li Îranê gotineke navdar heye ku dibêje “bişkokekê didin kesekî û dixwazin ku ji bo wê kut û şelwarekê çêke.” Mana wê ev e ku kesê ku tê girtin, divê bi her awayî be îtirafê bike.

Ev yek bi işkenceyên cisimî, tirsandin, ragirtina demdirêj di odeyên takekesî de, işkenceyên derûnî, gefxwarin bi malbatê an her rêbazeke din a ku berxwedana kesê girtî bişkîne, pêk tê.

Pir caran heta ku îtiraf ji wî neyê standin, di girtîgehan de biryara girtina demkî ya welatiyan jî dîsa û dîsa tê demdirêj kirin û qedera wan nexuya dimîne bo heyamên gelek zêde.

Di rastiyê de, di vê sîstema sexte de ti sûç û tawanek li gorî belge û delîlên rastîn nayê eşkerekirin.

Berovajî, berî ku ev kes bê girtin û paşê lêpirsîner bi pêkanîna her cure zext û zorê senaryoya ku ji pêş de amade kiriye wekî rastî li wî ferz dikin.

Min ji hin hevalên xwe yên zindanê bihîst ku digotin: “Li wir ne mirovahî heye, ne dilovanî û ne jî Xwedê; tu çareyeke din nîn e ji bilî xwe bi dest dan û tesilîm bûnê.

Girtina welatiyan, berî her tiştî, ne tenê ji bo pêşîgirtin ji çalakiyên wê kesê ye, belkû ji bo tirsandina civakê tê bikaranîn.

Bi afirandina tirs û wehişetê, peyaman didin xelkê û malbatan ku her kes ku çalakiyek bike, dê bi heman çarenûsê re rû bi rû be. Herwisa bi ragirtina dirêj di odeyên takekesî de û bi cezayên giran dixwazin ji bo yên din bibin dersa îbrêtê.

Ji aliyê din ve, dezgehên ewlehiyê li her bajarî, wek mînak li Urmiyê, hewl didin bajar û parêzgehê wek herêmeke ewlehî-tirsnak nîşan bidin. Ji bo ku ew îdiaya xwe rast derxin, hewcedarî bi zindaniyên ewlehiyê hene. Ji ber vê yekê li hêcetan digerin da ku xelkê bigirin û gelek caran tohmetên giran jî bi ser wan de disepînin.

Armanc ev e ku hem navê “bajarê ewlehî” bê diyarkirin û hem jî ji serokên xwe re îspat bikin ku bi girtina kesên “xeternak”, ewlehî hatiye parastin û kontrolkirin. Di encamê de jî amarên ku dixwazin ji navendê re pêşkêş bikin amade dikin û xelat û pîroznameyan jî werdigirin.

Ev çêkirina amarên derewîn, bi taybetî li herêmên qeraxnişîn û Kurdistanê, amûrek e ji bo ku her daxwaza rewa, sivîl û nasnamexwazî wekî metirsiyek li dijî ewlehiya neteweyî bê pêşkêşkirin û bê serkutkirin.

Li gorî tecrubeya min û tiştên ku min ji zindaniyên din bihîstine, ne dadwerek serbixwe heye û ne jî dadgehek serbixwe. Piraniya biryaran ji pêş de ji aliyê dezgehên ewlehiyê ve têne dayîn û dadgeh tenê roleke şanoyî dilîzin.

**3.Reftara berpirsên zindanan li hember girtiyên siyasî bi çi awayekî ye nêrîna Komara Îslamî li ser rexnegiran û dijberên xwe çawa ye?**

Çi di dema girtina demkî û di odeyên take kesî de û çi jî di dema zindanê de, li gorî tecrubeya min, armanc şikandin û heqaretkirin bi girtiyan e. Bi reftar, gotin, bikaranîna peyvên nebaş û bêrêzîkirin bi netewe, ol û malbata girtiyan, hewl didin asta berxwedan û bawer bi xwebûna wan gelek kêm bikin. Dixwazin hebûna wî ji her cûre fikr, bîr, rexne, nerazîbûn, hêvî û jiyanê vala bikin. Di odeyên yakekesî de ji vê rêyê îtiraf werdigirin û di zindanê de jî hêvî û daxwazên wî dixin asta herî nizm.

Bi kurtî, armanc jinavbirina girtiyan e Belê encama vê siyasetl ji kesekî bo kesek din tê guhartin û girêdayî armanc, bawerî û ev tişt û renca ku bo vê têkoşînl dike tê guhartin. Rejîma Îranê qet ne reformxwaz e û tu rexne an nerazîbûnekê qebûl nake. Bi kuştin û xwînrêjiyê hatiye ser desthilatdariyê û bi heman rêbazê jî berdewam dike. û şewata maşîna kuştinê jî xwîna ciwanan e.

Herçend rejîma Îranê bi tu peymanên siyasî û exlaqî ve girêdayî nîne û îspat kiriye ku ne Neteweyên Yekbûyî, ne saziyên mafên mirovan û ne jî raya giştî ji bo wî girîng in, lê dîsa jî divê tu zindaniyek di bêdengî û bêagahiyê de nemîne.

Ji ber ku di bêdengiyê de hem girtî û hem jî malbata wî zêdetir êş û azar dibînin û biryarên neheq jî zêdetir giran dibin.

Her weha ragihandin û navbirina zindaniyan ji bo wan hêvî û moralek e ku alîkariya wan dike ku berdewam bikin û bizanin ku ew nayên jibîrkirin.

**4. Mediyayên opozîsyonê li derveyî welat divê çi bikin da ku eşkerekirin û belgekirin bibin givaşên navneteweyî ya pratîkî û bibandor li ser rejîma Îranê, ne tenê nûçeyek demkurt?**

Medyayîkirina rewşa zindaniyan sedek bihêz li dijî projeya nehêlana bêdengiya wan. Dezgehên ewlehiyê bi berdewamî hewl didin kesên girtî îzole û tenê bikin, ji ber ku maşîna serkutkirinê tenê di tariyê û bêagahiyê de bi hemû hêza xwe dixebite.


Dema ku navê zindaniyekî, wêneyê wî û dengê mazlûmiyeta wî bi alîkariya tor û medyayên civakî û medyayên ku dengê wan digihîje raya giştî, têçûya işkencekirinê, cezayên giran û îdamê ji bo hikûmetê gelek zêde dibe.

Belavkirin û bilindkirina dengê van kesan, lêkoler û lêpirsên rejîma Îranê ji xelweta tarî ya girtîgehan derdixe û wan dixe beramberî dadweriya xelkê. Renge ev yeka serketî jî nebe, lê eşkerekirina cinayet û zordariyan ji bo tomarkirina wan di dîrokê de hewce ye.

Herwisa, di atmosfera giran û fetisînê ya nav bendên zindanê de, dema ku zindaniyek ji pişt dîwarên bilind fêm bike ku civak li pişta wî radiweste û dengê êş û qurbanîya wî li derve dengvedaye, îradeya wî ya berxwedanê bihêztir dibe.

Bêdengî mezintrîn xizmeta ku ji dezgehên ewlehiyê re tê kirin û kuşendetirîn zehre ji bo jiyana zindaniyan . Ji ber vê yekê erkê her mirovê azadîxwaz e ku bi şikandina vê bêdengiyê bibe deng û medyaya wan kesan ku di bêdengtirîn qatên vê sîstima îstibdadî de berxwedanê dikin.

# Kurdistan kabûsek dîrokî ya dagîrkeran e



N. Hesen Mukerem

Kurdistan axek û erdnîgariyek e ku rêjîmên Paşayetî û Komara Îslamî nekarîn ji nav bibin, Îro Kurdistan ne tenê naveke cografî ye, ew bîranînek zindî, wêneyekî dîrokî û rastiyek siyasî ye ku bi dehan salan bi tepeserkirin, darvekirin, dûrxistin û girtin û şer nekarîne jinav bibin.

Ji rejîma Pehlewî ve bigire heya rejîma Îslamiya Îranê, hemûyan hewl dane ku vê axê di bin givaşên ewlehiyê, siyasetên navendgerayî, înkara nasnameyê û tundûtûjiya dewletê de û mîlîtarîzîkirinê bêdeng bikin, lê Kurdistan ne bêdeng bû, û ne jî xebat û berxwe dana vê sekinî ye.

Ev rastî heman kabûs e ku xew ji çavên rêber û fermandarên terorîstperwer yên Spaha Pasdaran a Îranê herimandiye.

Rejîma Pehlewî, bi hemû hêz û qaweta xwe ya tepeserkirinê û artêşa navendî, nekarî mijara Kurdan çareser bike yanî nexwest çareser bike, ji ber ku mijara kurdistanê di bingeh de ne mijarek “ewlehiyê” bû, belku ew mijara maf, nasname, ziman û xwerêveberiyê ye.

Darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed, yekem serkomarê Komara Kurdistanê, di sala 1947an a Zayînî de, ne dawiya tevgerekê bû,belku destpêka bîranînek mayînde bû.

Ew darvekirin bo gelê Kurd û emegdarî bi rêbaza Kurdperweriya Pêşewa re, peyamek bû, Yanî ger ev buyer wate bidarvekirina serkomar li Kurdistanê û û ji gelê Kurd nebaya û her kîderê û di nava heçî neteweyekî din de baya, dikarî şikest û jinavçonê li pey xwe bîne, dijmin jî rast bi wê armancê serkomarê Kurdistanê êidam kir, lê gelê Kurd û dîrokê bersivek cûda da, nîşan da ku darvekirina rêberekê, neteweyekê ji holê ranake.



Rejîma Îslamiya Îranê bi rê û rêbazên hîn tundtir û hovanetir li ser heman rêyê dewam kir, lê di dawiyê de tenê hêrs, bêbaweriya bi rejîmê re û berxwedana gel zêde kiriye.

Terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê Giştî ê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li Viyanê di sala 1989an de, dema ku şandeya Kurd ji bo danûstandinan li wir bû, nîşan da ku rejîm ne tenê ne amade ye ku danûstandinan bike, belku di heman demê de danûstandin bi xwe jî weke dafikek bi kar tîne.

Ji dîtingeha piraniya Kurdan ve, vê kiryara terorîstî a rêjîma Îranê, peyamek zelal hebû, bo rejîma Îranê ne mafên Kurdan û ne jî jiyana nûnerên Kurdan girîng nîne.

Lê tişta ku desthilatdarên navendî her carê paşguh xistin e, şiyan û hêza dîrokî ya Kurdan e ku xwe birêxistin bikin, ji nû ve ava bikin û li ber xwe bidin.

Kurdistan pir caran rastî derbên giran yên dagîrkeran hatiye, lê her carê bi bîranînek tezetir û îradeyek xurttir dîsa rabûye ser xwe.

Ev hêz û şiyane ye ku îro ji bo Tehranê bûye gefek hertimî, gefek ne ji propagandayê, belku ji rastiya civakî û siyasî.

Her cara ku Îran dikeve nav krîzê, her cara ku pevçûnek herêmî dijwartir çê dibe, navê Kurdistanê dîsa di navendên analîzê de ye, ji ber ku ev ax ne tenê sînorek e, ew girêyeke ser dilê dijmin û çeper û kozikeke ku bi çi hêz û diminekê nayê girtin û herifandin.

Girêyek ku dikare gelek hevkêşeyan veke an jî bişkîne.

Başûrê Kurdistanê û hebûna baregehên Amerîkî jî ev hesasiyeta han çend qat zêde kiriye.

Ezmûna hilweşîna hikûmeta Sedam hîn jî di bîra herêmê de nû dibe, dema ku hêzên Amerîkî û hevalbendên wan axa Bşûrê Kurdistanê bikar anîn da ku ber bi Bexdayê ve pêşve biçin, Ev ezmûn ji Tehranê re nû ye ezmûn û kabos ku Kurdistan, di dema krîzê de, dikare bibe xala destpêkê ya guherînkariyên mezin.

Ji ber vê sedemê, rejîma Îranê li hember her tevger, her xwepêşandan û her nîşanek rêxistinbûnê li bajarên Kurdistanê tevgerek zêde ewle û bi fikar nîşan dide.

Tişta ku Kurdistanê ji gelek herêmên din cuda dike ne tenê çek an sînor in, belku ev îrade û hişmendî û berdewamiya li ser rêbaza rizgarîxwaziya neteweyî a gelê Kurd e.

Bîranîna dîrokekî dûr û dirêje ji xebat û berxwedanê, bîranînek ku darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed, terora Dr. Qasimlo û dehsalên cudakarî, dûrxistin û zordariyê ji bîr nekiriye.


Rejîma Pehlewî nekarî Kurdistanê ji bawer û hişê gel de bide jibir kirin, û rejîma Îslamî jî wê yekê nikare bike.

Her du rejîm, tevî hemî cûdahiyên xwe yên aşkera, tiştek hevpar hene, ku ev jî tirsa ji Kurdistanê ye.

Tirsa ji neteweyekê ku wan gelek caran hewl daye bêdeng bikin, lê dengê wî gelî her carê bilindtir û xortir ji berê bûye.

Îro, Kurdistan ne tenê mijareke etnîkî an sînorê destkird e; ew mijareke dîrokî, jeopolîtîk û netewî û exlaqî ye.

Ew cihek e ku çarenivîsa herêmê, tepeserkirina dewletê û mafê hebûna neteweyan tê de bi hev ve girêdayî ne, û ev girêya ku ji duh heta îro ji bo desthilatdarên Îranê bûye kabûsek bêdawî.



# Îxaneta Hestyarî, Birîneke Bêdeng a Jinan e



N. Sefiye Xalidî



Di gelek civakên kevneşopî û mêr serdest de, îxanet an bêwefatiya hestyarî hîn jî bi qasî bêwefatiya cinsî bi ciddî nayê girtin.Carinan, dema ku zilamek zewicî bi jinek din re dikeve têkiliyek hestyarî, mirov wê wekî “tenê axaftin” balkişandinek bê zirar, an tiştek normal ji bo mêran bi nav dikin.

Lêbelê, ji perspektîfek psîkolojîk ve, bêwefatiya hestyarî dikare ji bo hevjînekê yek ji birînên hestyarî yên herî kûr û wêranker be, ji ber ku tiştê ku şikestî ye ne tenê pabendbûnek derveyî ye, lê ewlehiya hestyarî, bawerî, xweqîmet û girêdana psîkolojîk a di navbera du kesan de ye.

Bêwefayîya hestyarî wê demê çê dibe ku kesekî zewicî enerjiya hestyarî, balkişandin, nêzîkbûn, girêdayîbûna hestyarî, axaftinên kesane û beşek ji pêdiviyên xwe yên hestyarî vediguhezîne kesekî li derveyî têkiliya sereke. Di vê rewşê de, hevjîn xwe ji cîhana hestyarî ya hevjînê xwe dûrxistî hîs dike.

Jina ku tê xiyanetkirin bi gelemperî ne tenê ji ber hebûna jina din êş dikişîne, belku ji ber ku mêrê ku divê cihê ewle yê hestyarî yê wê be, hest, balkişandin û nêzîkbûna xwe li cîhek din veberhênan kiriye.

Ji aliyê psîkolojîk ve, yek ji encamên pêşîn ên bêwefayiya hestyarî hilweşîna xwebaweriya jinê ye. Gelek jin, piştî ku xiyanetê kifş dikin, her tim ji xwe dipirsin: Çi kêmasiya min hebû? Çima wî ez nedît im? Çima ew di axaftina bi jineke din re rehettir bû? Çima ew ji têkiliyê reviya li şûna ku hewl bide wê rast bike?
Ev pirs nîşan didin ku jin xiyanetê tenê wekî tevgereke derveyî nabîne, ew wê rasterast bi nirxa xwe ya kesane ve girêdide.

Dibe ku ew bawer bike ku ger ew têra xwe xweşik, têra xwe dilovan, têgihîştî, an jî têra xwe hezkirî bûya, mêrê wê berê xwe nedida kesekî din.

Lê di gelek rewşan de, xiyanet kêmtir li ser kêmasiyên hevjînê ye û bêtir li ser nekarîna hevjînê bêwefa ye ku hestan birêve bibe, nakokiyan çareser bike, berpirsiyariya hestyarî bigire ser xwe û gihîştina psîkolojîk nîşan bide.
Bêwefayiya hestyarî cureyekî birîndarbûna girêdanê diafirîne. Di têkiliyên hestyarî yên kûr de, mirov hevjînê xwe wekî çavkaniyek ewlehiya psîkolojîk dibînin.

Dema ku heman kes dibe çavkaniya êş, nepenî û bêewlehiyê, hiş û hest di nav wan de aloziyeke giran dijîn.
Jinek dikare hîs bike ku erdê di bin wê de winda bûye, ji ber ku kesê ku ew bi tevahî pê bawer dikir niha bûye çavkaniya sereke ya nebaweriyê.

Gelek jin piştî bêwefayiya hestyarî nîşanên mîna trawmayê dijîn: bêxewî, fikar, ramanên obsesîf, dubarekirina bûyeran di hişê xwe de dubare, hesasiyeteke zêde li hember telefon û peyaman, bêbawerî, windakirina balkişandinê, hestên şermê, hêrsa tepeserkirî, û heta depresyon.

Hin jin bi berdewamî xwe bi jina din re didin ber hev û hêdî hêdî wêneyek neyînî ya xwe pêş dixin. Ev berawirdkirin dikarin bibin sedema hestên kûr ên bêqîmetiyê.

Di civakên kevneşopî de, zexta çandî pir caran vê birînê hîn aloztir dike. Ji jinan re tê gotin: Ji bo zarokan bimînin. Mêr jî wisa ne. Heke hûn wî efû bikin, malbat dê sax bimîne. Jinberdan an jî veqetandin dawiya her tiştî ye.

Ji ber vê yekê, gelek jin qet derfet nabînin ku hêrs, xemgînî û îfadeya hestyarî bi awayekî saxlem biceribînin. Ew neçar in ku pir zû bibexşînin, dema ku derûniya wan hîn jî birîndar e.

Bexşandina bi zorê bêyî şîfaya rastîn pir caran êşê dixe nav tebeqeyên kûrtir ên derûniyê. Jinek dikare ji derve di zewacê de bimîne, lê di hundur de hestên tenêtî, nebaweriyê û têkçûnê hilgire.
Ji perspektîfeke psîkolojîk ve, mayîna di têkiliyê de nayê wê wateyê ku baş dibe. Ger mêr berpirsiyariya tevgera xwe qebûl neke, xiyanetê kêm bike, jinê sûcdar bike, an jî tenê bixwaze xuyangê malbatê biparêze, birîna hestyarî ya jinê berdewam dike. Başbûna rastîn tenê gava ku hevjîna bêwefa berpirsiyariyê bi tevahî qebûl bike, têkiliya derve biqedîne, şefafiyet biafirîne, û bi rastî dem û hewldanê ji bo ji nû ve avakirina baweriyê veberhênan bike mimkun e.
Xalek din a girîng ew e ku bêwefatiya hestyarî ne tenê baweriya jinê bi hevjînê wê têk dibe, carinan ew baweriya wê bi xwe jî têk dibe. Ew dikare dest bi gumanbariya hest, biryar û heta nirxa xwe bi xwe bike. Ji ber vê yekê başbûn ne tenê li ser biryardana mayîn an terikandina têkiliyê ye, lê di heman demê de li ser ji nû ve avakirina xwerêzgirtin û nasnameya psîkolojîk a jinê ye.

Gelek jin piştî xiyanetê, xwe nedîtî hîs dikin. Ev hest yek ji êşên herî kûr ên mirovan e. Mirov hewce ne ku di têkiliyek hestyarî de hîs bikin ku têne bihîstin, têgihîştin û hilbijartin. Dema ku zilamek, li şûna ku hewl bide têkiliyê sererast bike, enerjiya xwe ya hestyarî dide jinek din, dibe ku jina wî vê yekê bi vî rengî şîrove bike: Ma ez ne hêjayî wê hewildanê bûm?.
Lê belê bêwefayî nîşaneya nirxa rastîn a jinê nîne. Hilbijartina xiyanetê biryara kesekî ye ku nikarîbû bi awayekî saxlem bi pirsgirêkên têkiliyê re rû bi rû bimîne. Ji ber xiyaneta hevjînê xwe, tu jin bêqîmet, nebaş, an jî bêhez nabe.

Di dawiyê de, bêwefatiya hestyarî birînek e ku dibe ku bi salan di derûniyê de bimîne, nemaze dema ku êşa jinê were paşguh kirin an jî dema ku ji wê tê hêvî kirin ku tenê ji bo parastina malbatê bêdeng bimîne. Ji bo qenckirina vê birînê, bihîstina hestên mirovan, wergirtina piştgiriya psîkolojîk, ji nû ve avakirina xwebaweriyê û carinan jî lêgerîna terapiya profesyonel hewce dike. Ji ber ku dilê mirovan tenê bi berdewamiya jiyanê qenc nabe, ew bi têgihîştin, ewlehî, rastgoyî û rêzgirtina nûkirî qenc dibe.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Hêzên hov ên rêjîma Îranê, li Dalahoyê 2 bira bi teqeya rasterast kuştin

Meysam Weysî û Mucteba Weysî, ku herduk bira bûn, du çalakvanên çandî yên peyrewên ola Yarsan, bi guleyên rasterast ên hêzên Spaha Pasdaran, hatne kuştin.

Meysam Weysî û Mucteba Weysî du birayên Kurd, ji çalakvanên naskirî yên çandî û medenî û ji peyrewên olaYarsan, piştî êrîşa hêzên Spaha Pasdaran bo ser cihê mana wan li bajarê Dalahoyê, bi derba guleyên rasterast ên van hêzan, hatin kuştin. Hevdem, çarenivîsa welatiyekî din ê bi navê Ferşad Hatemîpûr ku li wî cihî amade bûye, heta niha nediyar e.

Li gorî raportan, sibêdeha roja pêncşemê 7ê Cozerdana 1405an, hêzên Spaha Pasdaran cihê mayîna Meysam Weysî û birayê wî Mucteba li gundê Qela Kewş ê ser bi bajarê Dalaho li parêzgeha Kirmaşanê xiste bin dorpêçeke tam. Li gorî zanyariyên hatine belavkirin, hêzên rejîmê bêyî agahdarkirina pêşwext ji çend aliyan ve gule bi ser wê male de reşandine ku ev du bira tê de bûne û di encamê de ev du bira li cihê bûyerê hatine kuştin.

Ev herdu birayên Yarsanî damezrînerên pirtûkxaneya Kurdî li bajarê Kirmaşanê bûn û di warên curbecur ên medenî de xwedî çalakiyên berçav bûn, herwisa rêkxistinkarê merasimên Newrozê yên Kirmaşanê bûn. Çend meh bûn ku ji aliyê hêzên ewlekariyê ve di bin çavdêriyê de bûn û hewla girtina wan dihate dan.



Hêjayî gotinê ye ku ev herdu bira ji bilî çalakiyên medenî, ti çalakiyeke leşkerî encam nedane, lê belê şêwaza kuştina wan bi vî rengî bûye ku ji bilî terorê ti navekî din hilnagire.

## 3 ciwan li bajarê Mihabadê de ji aliyê hêzên rejîmê ve hatne destbiserkirin

Li dirêjeya pêla destbiserkirina welatiyên Kurd li rojhilatê Kurdistanê, sê ciwanên xelkê bajarê Mihabadê ji aliyê hêzên ewlehiya Komara Îslamî a Îranê ve hatine girtin û bo cihekî nexûya hatine veguhastin.
Li gorî raporta rêkxistina mafê mirov a Kurdpayê, sibêdeha roja Dûşemî 4ê Cozerdana 1405an, hêzên ewlehiyê bi awayekî serberedayî û bê belgeyên yasayî, êrîş kirne ser mala welatiyan li gundê Befrawan a ser bi Devera Şamatê girêdayî bajarê Mihabadê.
Di vê êrîşê de du bira yên bi navên Ehed Xeyrî û Wahîd Xeyrî û ciwanek din yê bi navê Mensûr Ebasî hatine destbiserkirin.
Çavkaniyek agehdar di vê derheqê de ragehandiye ku tevî lipeykeftinên berdewam ên malbatên wan, heya dema belavbûna wan nûçeyan çavnihêrî û lipeykeftinên wan bê encam mane.
Heya niha ti zanyariyek li ser sedema girtin, cûreyên tohmetan û cihê ragirtina wan sê ciwanên Kurd li ber dest nîne û navendên ewlehî ên rejîmê di vê derheqê de ti bersivek nedane.



## Kasibkarekî Kurd bi teqeya hêzên rejîmê li Serdeştê hate kuştin

Qazî Kawanî, kasibkarê xelkê Devera Serdeştê ku çend şevan berî niha bi teqeya rastewxwe a hêzên Komara Îslamiya Îranê ve hatibû birîndarkirin, bi sedema kurahiya birînên xwe canê xwe ji dest da.

Li gorî raportan, ew kasibkar ku xelkê gundê Dolletû yê ser bi Devera Serdeştê ye, li çend şevên derbasbûyî de li sînorê, Casûsanê kefte ber destrêjiya guleyên hêzên çekdar ên rejîmê û gule bi serê wî keftibû.

Navbirî bi sedema xirabiya rewşa tendirûstiyê ve bo yek ji nexweşxaneyên bajarê Mihabadê hatibû veguhastin, lê tevî hewlên pizîşkî şeva derbasbûyî bi sedema kurahiya birînên xwe koça dawiyê kir.



# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (519)